
Helbest
(1)
Landîka hesta

# *Landika hesta*

*Helbest*

*( 1 )*

Navnîşan ................... Landika hesta

Derhiner ...................... Şepal Hêvo

Wêneyên matîv ................. Bengîn xelîl

Nexşandina qapê .............. hemada selîm

Sipas ji bo Ebdula Hewas........................

# Diyarî

Ji bo mamoste **Ferhad Icmo** ê qêrîna yekemîn di asoyên van helbesta de

Qêrîn kir û sînga xwe li ber tîrên kevanê kalekî tazî kir

Ta ku gulekê bide destê ciwanekî .

**Alan Hesen**

**2010\1\24 Qamişlo**

## Pêşgotin

Dema dest dirêj kirin !
xewna û xwestin ku hêviya ji
xortaniyê bi revînin û ciwaniyê bê
viyan bin gor bikin .

Piştî ku xwîn û xwêdan tev li hev bû
li ser dergehên girtî ji lêdanê û destên
me man vala û bê silav hatin
xapandin .

Pêwîst bû ku **Landika hesta** bê
amadekirin û zemînê dibin lingên ku li
ser sînorên gora sekinî mane û dibin
lingên lerizîde bihejîne .

Pêwîst bû ku em leylanan nêçîr bikin
û rastiyê jê parzûn bikin diva bû ku
aso bibe
kaxezek dibin pênûsa ramanên
ciwanande .

Bi hêvî û evîn û viyan ciwan li hev
civiyan û paşe roj li hev pîroz kirin û
di nava pelên **landika hesta** de dîlana
helbestvana germ kirin .

Bê civan û bi zelalî dibin siya bîr û
baweriyê de xewnên xwe hûnandin .

Bi hêz hebûn ji himêzeke westiyayî

û pîr bûyî revandin û tovên ramanan
di nava axa payîz xêrekê de bi hêvî
bê sînor bê tirs çandin .

Perdên reş tev qetandin û rastiya xwe
ji bin cilikên gemar û kevnar e
derxistin û

li ber roka hebûnê raxistin û bi yek
qêrînê gotin êdî em hew bi tinebûnê

razî dibin êdî win nikarin tûjbûna pênûsên me ko bikin

Me gelek şev di Landika rojhelatê de lorandin û gelek sitêr û çiraxên bi ronî riwê xwe ji me guhertin .

Me bi xwêdanê û hêsir û xwînê nivîsand û kaniyên helbesta me parzûn kirin ta em karibin bi **Landika hesta** qêrîn bikin .

çimkî gelek cara bi roka tûj re baran dibare û gelek cara bi kenê ji dil re rondik dibare lê hemî cara û hemî dema ji pênûsa ciwana hêvî dibare .

**Şevger ê Kurdî**

**û**

**Alan Hesen**



## *Ala sipî*

Dema min ramûsanek

Ji dêmên te revand

Herû çavên min

Peyva ( na )

Ji ser lêvên te dizîn

Û buhara sînga te

Ala sipî ji bo min hilda.

**Alan Hesen**

## *Pirs*

Ji min pirsîn ew kiye

Ji bo te çiye ...?

Min got :

Her tişte û tişteke

Her tişte ji bo her tiştî ye

Û tişteke bo ....?

**Ardelan**

## *Amade me*

Kengî ti bê amade me

Di şevê de


Di rojê de

Di buhiştê di docehê de

Amade me

Kengî ti bê amade me...

**Egîd Tahir**



## *Kengî*

Tu na bîne ez dihilim mîna mûmekê

Ezê kengî di nîgaşê te de

Bibm xewnek

Şevek

Çîrokek

Kengî

Kengî bibim .bibim ....?

**Fîxan**

## *Lêborîn*

Li min negir

Min ji mêj de

Sînor û yase tev naskirin ...

Lê ewrên evînê

Bi nazdarî

asoyên birîndar derbas kirin...

û baxên şevînê

ji payîza çavên min û te

baranên lave kar pars kirin ...

......?

## *Toşî*

Di çavên te de razek heye

Çiqas lê dinerim

Kûr dibe


Ji lewra

Dema min nizanî bû

Ez li çi digerim

Min tu dît.

**Jiyan Şêxo**



## *Çima*

Me hev naskir

Me ji hev heskir

Pir xewn me ava kirin

Em negihiştin hev

Çima

Gelo...

Çend hezar çima

Bê bersiv

Mirin di dilê me de...?

**Kurdyar**

## *Mêvan bimîne*

Xwe berde paytexta dil

Ava ke bi evînê

Samanên wêran kirî

Û tê de mêvan bimîne

Şev û roja .

**Memo**

## *Hem lê neme*

Ez neme

Lê heme

Heme lê

Tune me

Hebûn û tunebûna min

Ji ber te ye .

**Mizgîn qamişlo**



## *Xanê min*

Were min hilm bike

Li nav gulan

Û min maç bike

Li bin baranê

Gelo .

Maçên te pirin

Yan çipikên baranê...?

**Narîn Metînî**

## *Rêwiyo*

Rêwiyo dûr bimîne

Û li der dora keleha xewnên

min ne gere

Min tu ji bîrkiriye

Û sed kêl bi navê te

Di dilê min de hene .

**Pêl Ibrahîm**

*Ne ewe*

Silav li min kir

Dengek zelal ket guhê min

Heyv dûr bû hat ba min

Dest da destên min

Li hev ketin kabê min

Ne ewe yara min

Pelek ji payîza wê ye

Li ber çavên min.

**Roder**



## *Şahiyê*

Şahiyê dev ji min berda

Ez di deriya dûr bûnê de

Av jeniyê nizanim

Ji wan weyê ez dînim

Nizanin ku ez rizgar dibim .

**Rizgar Alûcî**

## *Yarê*

Çend pênûs min guvaştin ji bo te

Ta bi helbesta kil bikim herdû çavan

Lê li jînê min nedî qet

Pesnek li gorî reşika çavên te .

**Sîpan Xelîl**

## *Sûnd*

Piştî ku ....

Cejina hêsra li çavên te

Pîroz bikim

Ezê dil bi heft ava bişom

Ji gunehên evîna te.

**Şevgerê Kurdî**

## *Cejin*

Ev çi cejin e

Ev ne cejin e ...?

Ezê vê cejinê bi qurbana

Dîtina te bikim

Dîtina te bo min cejin e

**Alan Hesen**

## *Dergehê dil*

Bi sedan zerî

Muhra xwe li dil xistin

Û dil derî venekir

Lê ..........

Bi dîtina te deriyê dil herifî .

**Ardelan**



## *Neynik*

Ez şeydayekî xapandî me

Ez dîmenek guvaştî me

Lê di herdû neynikên çavên te de

Ez şepalê cîhanê me

Û keyê evîndara me

**Egîd Tahir**

## *Pêlên xewna*

Ezê çawa va axînan

Li ser pêlên xewnên te siwarkim

Da ku karibim

Bi bişkivînim xweziyên cara .

**Fîxan**

## *Qamişlo*

Qamişlo

Ez û tu

Bi hev re mezin dibin ...!

Gelo ...


Wê kî ji me . bimire ....?

Wê kî ji me ,

Mezin tir bibe ...?

Ez û tu ....

.......?



## *Bingeha jînê*

Her têlek ji tembûra te

Dilê evîndara pê diheje

Û her tîpek ji helbestên min

Êşa welatekî dibêje

Ji lewra ez û te hene.

**Jiyan Şêxo**

## *Bîranîna te*

Ne pêwîste bijîm .

Çendîn bi min re tu dijî

Zemînim ez

Bêyî rojê

Ewarekim di tariyê de

Na jiyanê dijîm .

Tenê bi bîranîna te re

Omîd ....

Di dilê minde vedijî .

**Kurdyar**

## *Bi tirse*


Xapedarin çavên te

Weke derya xuya ne

Bi tirsin bi sawin

Gemiya dil ger xwe bede avê .

**Memo**



## *Kenê girî*

Şevê din pir keniyam

Ta ku ji keniya min

Rondikên xwînê

Bariyan.

**Mizgîn qamişlo**

## *Şeva tarî*

Dema min çîroka xwe

Ji şevêre got

Tariya dilê min

pêre bû heval

ji lewra .

şev tarî bû

**Narîn Metînî**

## *Vegere*

Vegere li jiyana min

Vegere li pelê min


Û ji tîpan kelehan ava bike

Vegere bi te xwena min xweşe

Vegere vegere

Tu ji gerê westiyayî.

**Pêl Ibrahîm**



## *Gulistana min*

Gulistana min

Kesk û sor û zer e

Li ser dara aşîtiyê difire

Gula sor çavên pêxembera li sere

Gula zer ya min e

Di tirsim hinek bibin ji xwe re....?

**Roder**

## *Ji te hesdikim*

Bi tenê dinivîsim

Hesdikim

Ji ber ku evîn li ser dêmên te ne

Biçûkaniya windayî

Di rewanê te de dibînim

J . t . h ..................?

**Rizgar Alûcî**

## *Jîn*

Jîn bi dîtina te ji nû jîn dibe

Buhara di talda siya payîzên

Nixumandî de

Bi dengê te mîna çîmenek buhiştî

Geş dibe

Yarê kanî ew roj

Roja bibînim ez û te hene ...

**Sîpan Xelîl**



## *Bese*

Ji hêsirên xwe derewan bugvêşe

Û carekê tenê ji dil bigirî.

**Şevgerê Kurdî**

## *Bêrîvan min*

Dema te got:

Min jibîr nek

Min jiyan jibîr kir.

**Alan Hesen**

## *Bê çar*

Xwe dugvêşim ji evîna te

Da ku ziwa bibim

Lê wek pir caran

Şil dibim bi dîtina te.

**Ardelan**

## *Pêşgotin*

Berî pêşgotina gotina te

Gotineke min bo te heye.....?

**Egîd Tahir**

## *Buhara helbesta*

Bela ziman rabe û pesnê te bide

Bê te çend gulên

Kesk û sor û zer

Ji buhara helbestên min çiniye.

**Fîxan**



## *Xefk*

Te du xefk

Bi salan

li ser sînga xwe

vedayî hêlan ...

lê ji min pêve

tu kesî

li liboka neda...!!

.......?

## *Raz*

Min raza xwe

Ji derya re got

Pêla evîna min

Eşkere kir

**Jiyan Şêxo**

## *Di gerim*

Pênûsê...

Di dilê xwe de dilorînim

Û awiran

Li paravê çavên zînê

Zîna mîdî di gerînim

Hîna ...

Ez evîndarekî rêwî me.

**Kurdyar**



## *Nervîn*

Nervîna min

Bi xweşî bi nazî were

Berest û mestim

Li ber aveke tî

Ne guneh karim

Ne sitem karim

Birîndarim

Evîndarim

Min ne xapîne.

**Memo**

## *Yazdana dil*

Her mirovek di jînê de

Naveke

Gelo yazdana dil

Wê ji navê te hebin

**Mizgîn qamişlo**

## *Diyarî*

Elesa bê ji heymana

Bêhna bilûrê dişîne

Ji awazên kevne torî ristên

Xanê diweşîne

Evîna mem û zînê dineqişîne

Ji xewneroja jînê re

Baweşîne ...baweşîne .

**Narîn Metînî**



## *Nav*

Raste te gelek nav

Li min kirin

Lê ........

Ji dîno û dilo û dildaro

Xweştir tinebûn.

**Pêl Ibrahîm**

## *Aferî*

Îro cejin ebi nameya te

Çi xweş xewne dengê te

Aferî dibim ez bi dîtina te

Min navê cejina....?

Cejina dûrî te.

**Roder**

## *Girî*

Giriyê min tê

Li sikakên bê zarok


Bê ax û toz

Bê lîstik û rastî

Hooo

Kanî ew demên berê .

**Rizgar Alûcî**



## *Evîna te*

Dema ji gulê hest dibarin

Û ji bilûrê awaz dertên

Radibe ji xewê

Sira bîranîna te

Û leyanê kavila

Dîsa evîna te

Jîn dike .

**Sîpan Xelîl**

## *Ramûsan*

Di şerê lêv û lêvan de

Gelo...?

Hest bi gorî gunehan dibe

Yan guneh bigorî hestan dibe.

**Şevgerê Kurdî**

## *Jiyanê*

Piştî ez ji pesnê te westiyam

Min pênûsa xwe danî

Û min navê te kir

.................?

**Alan Hesen**



## *Warê dîna*

Li bajarê dîna aferîm

Û bûm yek ji wan

Lê bi dîtina te

Bûme serokê dîna.

**Ardelan**

## *Tu çiye*

Sîngên te çiya ne

Tiliyên te şaxên dara ne

Çavên te sitêrin

Rîhan xwe ji bejnê vedişêrin

Rûyê te roje

Gerden befrê dinoşe

Ma tu çiye.......?

**Egîd Tahir**

## *Êşa te*

Dema awazên giriyên te

Zemîn dihejandin

Bawer bike

Ji min pêve ,kesî nizanî bû

Êşa te çiye .

**Fixan**

## *Helbest*

Razekî bê nav e...

Ristek ji gul û kulîlkan

Liser rûpelan belav e...

Di navbera jîn û mirinê de

Mûyekî dirêj û zirav e...

Hin dibêjin gazin e

Hin dibêjin tawan e

Hin dibêjin dîlan e

Ez dibêjim tîbûn û lave lave...

.......?

## *Westiyam*

Çawa ezê sînorên

Bendewariyê derbas bikim

Û evîna te roj bi roj

Xwîna min tîr dike.

**Jiyan Şêxo**

## *Bê jiyanim*

Em jî hêjayî rojê ne

Bihejîne du lêvan

Di nav lêvên min de

Bimije û ez dê bimijim

Ta xwîn bête der

Roj di nîva şevê de hilê

Canî canan...

Bela şev li tariya xwe vegere.

**Kurdyar**

## *Asoyên dûr*

Asoyên dûr di çavên te de dibînim

Digerim û digerim

Ta ku di gerê de winda dibim.

**Memo**

## *Hisret*

Hemî deryayên cîhanê

Ji dilopên çavên min

Xwe hûnandin

Li dû doza ji te maçekê

Lê te neda

**Mizgîn qamişlo**

## *Çavên te*

Çavên te şeveke bê deng e

Êvareke reng reng e

Ez xistim raza jiyanê

Û li ber bayê narînê

Ez ketim xewa evînê

**Narîn Metînî**

## *Hêviyên şeva*

Gelek şeva li ber deriyê te

Hêsirên min ziwa bûn

Û çarekê te pençra xwe

Venekir ............?

**Pêl Ibrahîm**

## *Çi bêjim*

Riwê te asîmane

Û heyv li ser wan çava ne

Xala te sitêr e

Lêvên te bi qurbane

Çi bêjim kême

Firiştek ji cem yezdan e.

**Roder**

## *Xewnek*

Şeveke bê deng

Bayekî har ez şiyar kirim

Taya mirinê bi ser min de

Anî xewnek ........?

**Rizgar Alûcî**

## *Hestên şewitî*

Di rêka bîranînên te de

Tîpên ji raman dertên

Bi şerm û fedî ne

Di gel hestên şewitî de

Pêk naînin ti çarî

Bêriya dîtina riwên dîdarî.

**Sîpan Xelîl**

## *Şermînoka min*

Gelek hêvî di çavên min de

Westiyan

Ta min kenekî tirsiyayî

Ji ser lêvên te dizî.

**Şevgerê Kurdî**

# *Naverok*


| *Helbest* | *Helbestvan* | *Rûpel* |
|---|---|---|
| *Ala sipî* | *Alan Hesen* | *9* |
| *Pirs* | *Ardelan* | *10* |
| *Amade me* | *Egîd Tahir* | *11* |
| *Kengî* | *Fîxan* | *13* |
| *Lêborîn* | *.......?* | *14* |
| *Toşî* | *Jiyan Şêxo* | *15* |
| *Çima* | *Kurdyar* | *17* |
| *Mêvan bimîne* | *Memo* | *18* |
| *Hem lê neme* | *Mizgîn qamişlo* | *19* |
| *Xanê min* | *Narîn Metînî* | *21* |
| *Rêwiyo* | *Pêl Ibrahîm* | *22* |
| *Ne ewe* | *Roder* | *23* |
| *Şahiyê* | *Rizgar Alûcî* | *25* |
| *Yarê* | *Sîpan Xelîl* | *26* |
| *Sûnd* | *Şevgerê Kurdî* | *27* |
| *Cejin* | *Alan Hesen* | *28* |
| *Dergehê dil* | *Ardelan* | *29* |
| *Neynik* | *Egîd Tahir* | *31* |

| | | |
|---|---|---|
| *Pêlên xewna* | *Fîxan* | *32* |
| *Qamişlo* | *.......?* | *33* |
| *Bingeha jînê* | *Jiyan Şêxo* | *35* |
| *Bîranîna te* | *Kurdyar* | *36* |
| *Bi tirse* | *Memo* | *37* |
| *Kenê girî* | *Mizgîn qamişlo* | *39* |
| *Şeva tarî* | *Narîn Metînî* | *40* |
| *Vegere* | *Pêl Ibrahîm* | *41* |
| *Gulistana min* | *Roder* | *43* |
| *Ji te hesdikim* | *Rizgar Alûcî* | *44* |
| *Jîn* | *Sîpan Xelîl* | *45* |
| *Bese* | *Şevgerê Kurdî* | *47* |
| *Bêrîvana min* | *Alan Hesen* | *48* |
| *Bê çar* | *Ardelan* | *49* |
| *Pêşgotin* | *Egîd Tahir* | *50* |
| *Buhara helbesta* | *Fîxan* | *51* |
| *Xefk* | *.......?* | *53* |
| *Raz* | *Jiyan Şêxo* | *54* |
| *Di gerim* | *Kurdyar* | *55* |
| *Nervîn* | *Memo* | *57* |
| *Yazdanê dil* | *Mizgîn qamişlo* | *58* |

| | | |
|---|---|---|
| *Diyarî* | *Narîn Metînî* | *59* |
| *Nav* | *Pêl Ibrahîm* | *61* |
| *Aferî* | *Roder* | *62* |
| *Girî* | *Rizgar Alûcî* | *63* |
| *Evîna te* | *Sîpan Xelîl* | *65* |
| *Ramûsan* | *Şevgerê Kurdî* | *66* |
| *Jiyanê* | *Alan Hesen* | *67* |
| *Warê dîna* | *Ardelan* | *69* |
| *Tu çiye* | *Egîd Tahir* | *70* |
| *Êşa te* | *Fîxan* | *71* |
| *Helbest* | *.......?* | *72* |
| *Westiyam* | *Jiyan Şêxo* | *73* |
| *Bê jiyanim* | *Kurdyar* | *74* |
| *Asoyên dûr* | *Memo* | *75* |
| *Hisret* | *Mizgîn qamişlo* | *76* |
| *Çavên te* | *Narîn Metînî* | *77* |
| *Hêviyên şeva* | *Pêl Ibrahîm* | *78* |
| *Çi bêjim* | *Roder* | *79* |
| *Xewnek* | *Rizgar Alûcî* | *80* |
| *Hestên şewitî* | *Sîpan Xelîl* | *81* |
| *Şermînoka min* | *Şevgerê Kurdî* | *82* |



Ev berhem ji bo alîkariya
nexweşên PENCEŞÊR ( SERETAN )